

Mamoste Mistefa Tatoz Jiyana xwe ji dest da

Li roja Şemiyê. 21-04-2624k-2012z mamoste M. Tatoz li bajarê Heleb, di nexweşxana Firansî-Sûrî de jiyana xwe ji dest da û çû dilovaniya Xwedê. Li roja dî, bi beşdariya gelek meriv, dost û berketiyên wî, cenaza gorbihuşt berve bajarê Efrînê hate birêxistin. Di dûre, di mal de hate şuştin û li goristana Zareta Henên hate veşartin. Riwêresa veşartinê bi telqînê dest pê bû, di dûre dostekî wî M. Şêx Osman gotinek devkî pêşkêşî beşdaran kir, Paşê gotina Partiya Yekîtiya Demokrat a Kurd li ser hate xwendin û li dawiyê, birayê wî Cemîl sipasiya beşdaran kir.

Bi navê komîta rêvebiriya weşana Newrozê, em serê xwe, xwedî û dostên wî sax dikin û ji Xweda lava dikin, ku di bihuşta xwe de cîwar bike.



Deqê gotina YEKÎTÎ ev e:

Beşdarên rêzdar û bi rûmet, silav û rêz...!

Îro roj, roja yekşemê, 22.4.2624k – 2012z ye, roja koçbarkirina welatperwerê Kurd ê bi nav û deng Mistefa Tatoz e. kek Mistefa....! Vaye meriv, dost û hemî berketiyên te, bi dilekî xemgîn û çavên ziwa ji dûr û nêzîk hatine ser goristana zareta Henên – li rex nemirê kurd Dr. Nûrî Dêrsimî, ta ku, canê te yê paqij binax bikin, silava dawiyê li te bikin û xatirê xwe ji te bixwazin.

Xwîşk û birayên hêja....!

Mirin her mirine, lê, xwezî li cane mirovê ku tevdira xwe ji vê royê re kiribe, û kar û xebateke baş û bi kêrhatî ji bo gelê xwe –berî mirinê- li şûn xwe hiştibe. Gorbihuştê me Mistefa yek ji wan kesên, ku jiyana wî ne rij û tisî ye. Ew li sala 1950 î ji dayik dibe, li sala 1970 ê derbasî nav refên tevgera kurd li Sûriyê –El Partî- dibe, li sala 1974 an, di nav xwendekaran de, dibe endamê şaxê, û weha dimîne ta ku, li sala 1977an –ji bo

kar- dere Almaniya .Ji bîr nebe, ku kek Mistefa fêrnama macistêriyê di aboriyê de, li zanîngeha Helebê werdigre. Herweha çend salan li Almaniya kar dike û paşê ji nû ve vedigere cîwarê bav û kalên xwe û di zanîngeha Heleb de, kardike, Ta ku, li 21.4.2012 an bi nexwaşiya dil, di nexweşxana Firansî-Sûrî de, çavan vedimirîne û dere dilovaniya xwedê. Hêjaye bê gotin, ku mamoste Mistefa (bavê mesûd) jiyana xwe ya ne partî jî, weke welatparêzekî, ku nêzîk tevgera xwe ya Kurd derbas kir. Herweha wî ji zimanê kurdî jî gelekî hez dikir, ne tenê hezkirin û hew, lê bi kartanî jî. Bi taybetî nivîsandina gotaran û wergerandina berheman ji Almanî ta kurdî.

Li dawiyê em bi nave P.Y.D.Ks serê xwe, xwedî û hemî dost û berketiyên kek Mistefa sax dikin; sebir û aramiyekê ji wan re hêvî dikin, û buhuşta bilind û rengîn ji kek Mistefa û hemî şehîdên azadî û rûmetê, û bi taybetî yên Kurd re lava dikin. Careke dî xwedê sebrekê bi xwediyên de, tu eşek û te'iliyan negîne we, û sipas ji cefayê we tevan re.

P.Y.D.Ks

Dumahîk: Îsmail Beşikçî

YEyê de, Konferansa Îslamê de, di Yekîtiya 'Ereban de, di Teşkilata Hevkarî û Ewleyiya Ewropayê de, di Rêxistina Yekîtiya 'Erîqa de... dewletên ku serjimara wan li dora 30-40 hezarî ne jî hene. Li hember van rewşan divê Kurd pêwendiyên navnetewî bidin ber lêpîrsînan. Divê pêvajoya ku Kurdan bê statû hiştiye û sedemên ku Kurdên, xwedî serjimarêke ji çil milyonan zêdetir, bê statû ne bêne lêpîrsîn. Divê çapemeniya Rojava, Universiteyên Rojava, saziyên sivilên civakî jî vê lêpîrsînê bikin.

Wergera ji bo kurmancî: **Ahmed KANÎ**